
Kurdistan
Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin
PDK-S 1957 Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya
Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (262) | Sibat / 01-02-2024

## Serok Barzanî:

# Hun dikarin me bikujin lê piştrast bin hun nikarin îradeya me bistînin




Kurdistan

Serok Barzanî li ser êrîşên moşekî yên li ser Hewlêrê peyamek pêşkêşî raya giştî kir û têde ragihand, Hemî alî haydar in, her ji sala 2020ê heta niha bi dehan caran bajarê Hewlêrê keftiye ber êrîşên nerewa yên moşek û dronên artêşa Pasdarên Îranê û hêzên girêdayî wê. Ew êrîş zulm û neheqiyên eşkere ne li beranberî xelkê Herêma Kurdistanê tên kirin. Bikerên wan tawanan û aliyên ku li pişt êrîşên li ser Hewlêrê ne gelek baş dizanin ku bêbextî û behane û idîayên wan çi bingeh nînin û ji bo dapoşîna arêşe û griftên xwe wê destdirêjî û zulmê li dijî Hewlêrê û xelkê Kurdistanê dikin. Êdî bêhinfirehiya me sinor hene, vaye di dawî êrîş û tawana wan de şeva borî malbateka bêtawan a Hewlêrê hatiye komkujkirin ku em wê tawanê gelek bi tundî şermezar dikin. Goman tê de nîne ku ew êrîş ne merdatî û ne jî şehamet e belkî ji bo tawanbaran zêde şermezarî ye. Li vê derê gotina min ji bo gelên Îranê ye û me herdem rêz û hurmet ji bo gelên Îranê heye û me destê dostînî û biratiyê jê re dirêj kiriye. Ez dixwazim wan piştrast bikim ku ew behaneyên êrîşker ji bo tawanên xwe yên li dijî Hewlêrê û xelkê Kurdistanê tînin çi esl û esas nînin û ji rastiyê dûr in. ez daxwazê ji we dikim eger êrîşker rêyê bidin we, hûn bi xwe werin û bi çavên xwe li Hewlêrê rastiyan bibînin û bizanin ku tawanbar û êrîşker çawa têkdanê di derheqa gelê Kurdistanê de dikin û idîayên wan bêbingeh in. Nabe ku ew her li ser wê zulmê berdewam bin û nabe em jî êdî li bernaberî wê stem û neheqiyê bêdeng bin. Peyama min ji bo bikerên êrîşên moşek û dronên Îranî ev e, şehîdkirina jin û zarokan û xelkê me yê sivîl çi şanazî û serbilindî ji bo we tê de nîne. Hûn dikarin me bikujin lê piştrast bibin ku hûn nikarin îradeya me ji me bistînin. Pişta gelê Kurdistanê bi Xudê û rewatiya doza wî germ e û Xudê ji hemî zalim û hêzan mezintir e.

## Kar û çalakiyên Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî li Efrînê

Bo dema 11 rojan, şandeke Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî li Efrînê bû. Şanda Dezgehê hejmareke çalakî û serdan encam dabû, herwiha çend proje ragihandin ku hemû navçeyên Efrînê li xwe digre.

Hûrgilî rûpela .. 2




## Zêdetir bixwîne...

Idrîs Barzanî.. endezyarê lihevhatina niştîmanî û şoreşa Kurdistanê — Rûpel—3
Rola rewşenbîran di kûrahiya rastiyê de ye — Rûpel—4

# Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî di alîkarîkirina xelkê Efrînê de berdewam e

## Dezgehê bo 7 nahiye û 366 gundên Efrînê dest bi projeyan kiriye

Kurdistan

Piştî 11 rojan ji kar û xebata berdewam li Efrînê, şanda Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî vegerya Hewlêrê. Şanda Dezgehê hejmareke çalakî û serdan encam dabû, herwiha çend proje ragihandin ku hemû navçeyên Efrînê li xwe digre. Derbarê serdana vê şandê û encamên wê, Rojnameya Kurdistan dîdarek digel Berpirsê şandê û Endamê Desteya Kargêriya Dezgehê Rewaj Hacî kiriye.

**“300 malbatên nû vegeryane Efrînê ji alîkariyên Dezgehê sûdmend bûn”**

Li gor amarên ber destê Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî, ji destpêka meha 7’an ya sala bûrî hejamreke mezin ji xelkê Efrînê vegeryane ser mal û milkên xwe, 300 malbat navê xwe li cem dezgehê tomar kiribûn, wek Rewaj Hacî diyar kir. Hacî proseya belavkirina alîkariyan bi ser wan malbatan ve şirove dike, û wiha dibêje “Malbatên vegeryayî ji hemî nahiyên Efrînê bûn, lewma me alîkarî li



nahiye bi nahiye belav kirine, da ku malbatên sûdmend ne westin û rêyên dirêj negrin, û ew alîkarî ji sobe û betaniyan pêk dihatin”.

**“Nexweşxaneya gerok wê li 366 gundên Efrînê bigere”**

Di nava serdana xwe de, şanda Dezgehê projeya nexweşxaneya gerok destpê kiriye. Endamê Desteya Kargêriya Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî Rewaj Hacî got “Me ji gundê Evrazê li nahiya Mabeta projeya nexweşxaneya gerok destpê kiriye, ku her roj wê li gundekî yan didwan be û emê dermankirin û derman bê bermaber pêşkêşî nexweşan bikin.”




**“Radestkirina amêreke kolandin û kelûpelên xizmetguzariyê”**

Herwiha Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî amêreke kolandinê(Bagir), û kelûpelên locistî û barekî mezin ji kelûpelên xizmetguzariyê radestî Encumena Xwecihî ya Efrînê kirin.



**“Şanda Dezgehê digel mamosteyên Zimanê Kurdî civiya”**

Şandê pêşwaziya 42 mamosteyên Zimanê Kurdî ji 7 nahiyên Efrînê û gundên wê kir. Berpirsê şandê Rewaj Hacî derbarê civînê de got” Li Navenda Barzanî ya Çand û Geşepêdanê, me pêşwaziya mamosteyên Zimanê Kurdî kir, me diyariyek ji wan re pêşkêş kir û me li gilî û pêşinyarên wan guhdarî kir.



**“Alîkariya hemî xwendekarên Efrînî yên li Izazê dixwînin”**

Şanda Dezgehê digel 69 xwendekarên Kurd civiya. Di vê derbarê de Berpirsê şandê Rewaj Hacî diyar kir “Em digel hemî xwendekarên Kurd ên Efrînê ku li Zanîngehên Izazê dixwînin civiyan, ev 3’ê meh bûn me alîkariya darayî ji wan re pêşkêş dikir, da barê çûn û hatina wan sivik bibe”.

Hacî got” Me li pêşinyar û hizrên her 69 xwendekaran guhdar kir û dê berdewam çavê me li wan be û li xwendekarên xwe yên Zanîngehên Efrînê jî dibin xwedan, bila xwendekarên me serkeftî bin û ji xwendinê bê par nebin û em amade ne bo her alîkariyekê”.



**“1200 kes li çalakiya dawî beşdar bûn”**

Bi helkefta Roja Cîhanî ya Fêrkirinê, Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî çalakiyek cemawerî lidar xist.

1200 kes li çalakiyê beşdar bûn, ku piraniya wan bi cil û bergên Kurdî amade bûn. Derbarê çalakiyê Hacî ragihand “Di nava şeş mehan de, me 12 xulên rahênanê vekiribûn ku 128 kes ji xelkê Efrînê ji wan xulan sûdmend bûn .”

Di nava çalakiyê de berhemên xulên şêwekariyê, hunera portirê, hunera mozayîk û karên destî hatine nimayişkirin, herwiha hemî beşdarên wan xulan bawername wergirtin. Di nava çalakiyê de pêşangehek hunerî bo 9 hunermedên Efrînê hate lidarxistin. Xwendekarên yekem ên pola 12’an (Bekelorya) ji xelatên Dezgehê bê par nebûn digel beşdarbûna Koma Raperîn ya foloklorî ku çend dîlan ji kiltûra Efrînê pêşkêş kir, û birgeya dawiyê ji çalakiyê digel Navenda Awaz ya Mûzîkê bû, ku Mistefa Bekir û koma xwe çend stranên foloklorî ji mêvan re gotin.




-Serdana şanda Dezgehê roja 14’ê Çileya Paşîn destpê kiribû, û 25’ê heman mehê bidawî bû, tevî çalakiyan, rojane şandê serdana kesayetî û xebatkar û malbatên şehîdên Efrînê dikir û ji nêzîk ve rewşa wan dişopand û li pêşinyarên wan guhdar dikir. Piştî erdheja Cindirêsê, Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî roja 10’ê Sibata 2023’an derbasî Efrînê bû, wek yekem dezgeh bi hewara qurbaniyên erdhejê ve çûbû, û heta niha 101 tirêle alîkarî derbasî Efrînê kiriye. Roja 4’ê Tîrmeha 2023’an, Dezgehê bi piştevaniya Rêxistina Karitas a Elmanî Navenda Barzanî bo Çand û Geşepêdanê li Efrînê vekir.



# Idrîs Barzanî.. endezyarê lihevhatina niştîmanî û şoreşa Kurdistanê

Hêvî Delî- Qamişlo

Di dîroka Kurdî de gelek kesayetiyên niştîmanperwer û welatparêz bi roleke girin rabûn di pêvajoya tevgera rizgariya Kurdistanê de, û di bin sîpera Alaya Kurdî de karîbûn navên xwe bi tîpên zêrîn bi nexşînin, û destkeftên azadiyê û rûmetê bi dest bixin, yek ji wan qehremanan, Endaziyarê aştiyê û rêberê Kurdayetiyê pêşmerge “Idrîs Barzanî” ye ku di rêka têkoşîn û mêrxasî azadiya gelê Kurd de canê xwe yê pak kir fîda û di nav têkoşîna gel de bû nemûneyeke serhildanê di dîroka berxwedaniyê de çi di nav refên Pêşmerge de û çi di nav refên Partiya Demoqrata kurdistanê de, weke şervenekî wêrek û tijî baweriyeke bihêz bi dadperweriya doza gelê xwe bû, ne tenê li Kurdistana Iraqê, lê belê li herçar parçeyên Kurdistanê, û herwiha rola wî ya berbiçav di lihevhatin û yekkirina navmala Kurdî de, de ku Kurd bibin yek dest û destkefteyên ku bi saya xwîna Pêşmergeyan hatine bidestbixin. *Di “37”emîn salvegera koça dawiyê ya endeziyarê şoreşa Kurdistanê nemir “ Idrîs Barzanî” ronahiyek ser jiyan û xebata wî ya niştîmanperwerî: Pêşmerge “ Idrîs Barzanî”kurê rêberê gelê Kurd nemir Mistefa Barzanî di meha adara sala 1944an de, li Başûrê Kurdistanê li devera Barzan jidayîkbû, û di temenê 3ê salî de li gel malbata xwe rastî jiyaneke nexweş û dijwar, derbider, koçberî, û çewsandin, û gefên desthilata rêjîma Baxdayê ve hatin, ku ew ji gundê Barzan sergonî navçeyên Başûrê Iraqê kirin, û Idrîs Barzanî 11 salan ji dîtina bavê xwe bêpar me, piştî ku di wê demê sala 1947an, nemir Mistefa Barzanî û bi dehen Pêşmerge berê xwe dana Yekîtiya Soviyêtê. Û Lehengê nemir “Îdrîs Barzanî” ji malbatekê ye ku ji destpêka sedsalên derbasbûyê heta niha xwe spartiye di ber xizmeta doza Kurdî de, malbateka şoreşger xebatkar xwedî pirojeke netewayî û oldarî ya duv û dirêj e, di dîrokê de tên nasîn têkoşîna Barzaniyan ji bo berevaniya mafê gel û sînorê xaka pîroz ya Kurdistanê. Ku ew di ciwaniya xwe de rêka bavê xwe rêberê gelê Kurd “Barzaniyê nemir girt û bi dîtina êş û zordarî û setimkariya ji aliyê rêjîma Bexdayê li ser miletê Kurd, bi hezkirineke bihêz û geşbûneke hestên netewayî û Kurdayetî beşdarî şoreş û rêzên pêşmergeyan bû, êdî bû yek ji endamên yekem komên pêşmerge ku çek hilgirt ji bo parastina rûmet û rizgariya Kurdistanê, ku yek ji şagirtên dibistana Kurdayetî û rêbaza Barzaniyê nemir bû , temenê jiyana xwe xistibû bin doza azadiya mafê gelê Kurd de, kar û xebata xwe ya siyasî û leşkerî ji bilî hemû zehmetiyên ku li çol û çiyan de dikşandin berdewam dikir. * Di derbarî têkoşîna nemir” Îdrîs Barzanî” di warê siyasî û leşkerî de: Ku di sala 1961an, destpêkirina çirûskên şoreşa Êlûnê, “Îdrîs Barzanî” sala 1962an de, tevlî refên şoreşê û pêşmergeyên azadiya Kurdistanê bû û roleke wî berçev û giring di nêzîkkirina nêrînên partiyan de hebû. Û di sala 1966an, destana Hendirîn bi rêva bir. Di sala 1970an de, di kongireya heştemîn ya Partiya Demoqrata Kurdistanê weku endamê komîteya navendî ya wê partiyê hate hilbijartin. Di sala 1979an de, di kongirê Nehan de ji bo endamê mekteba siyasî ya Partiya Demoqrata Kurdistanê û serpereştiya karûbarên leşkerî hate hilbijartin, ta demeke dirêj wek berpirsê pêwendiyên giştî yên partiya PDK karkir. Û ji rexekî din ve dema destpêkirina danûstandinên li gel Hikûmeta Iraqê ji bo pêkanîna aştiya Kurdistan û Iraqê , “Îdrîs Barzanî “û birayê wî “Mesûd Barzanî” wek endamên şanda danûstandinan hatin hilbijartin, ku ji Salih Elyûsif, Nafiz Celal, Mehmûd Osman pêk hat, û “Îdrîs Barzanî “ji wê derê ji têkoşîn û şerê çekdarî derbasî têkoşîna siyasî û dîplomatîk jî bû. Û herwiha “Îdrîs Barzanî “jî bi rola xwe ya çalak di encamdana lihevhatina bi serkirdayetiya Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê û tevgerên din ên Kurdistanê re hebû ku di dawiya sala 1986ê de pêk hat, ji bo ku piştre bibe yekemîn navok ji bo avakirina eniyeke berfireh a Kurdistanê ku di meha Hezîranê de bi eşkereyî hate ragihandin.

> **Idrîs Barzanî xwedan roleke giring bû**

Û di rêkeftina adara Sala 1970 de nemir Îdrîs yek ji sazînerên rêkeftina aştiyê ku di navbera serkirdayetiya şoreşa kurdî li başûrê kurdistanê û Hikûmeta Bexdayê de bû, û çalkvanakî jêhatîbû di Endazyariya wê rêkeftinê de. û herwiha piştî rêkeftina Cezayîrê ya Xiyanetê li dijî gelê Kurd “Îdrîs Barzanî” bi zanebûna xwe ya siyasî û diblomatîk karîbû serkirda û hêzên Kurdistanê li hundirê Başûrê Kurdistanê de bighîna hev û yekrêziya navmala Kurdî avabike , û ji ber vê rola wî ya giring di pêvajoya tevgera rizgariya Kurdistanê navnasiya Endazyariyê şoreşa Kurdistanê lê hat kirin. Û hêjaya were gotin ku di 31 ê çileya sala 1987an, Idrîs Barzanî ji ber nexweşiyeke giran koça dawî kir, bi destdana lehengê Pêşmerge gelê Kurd û tevgera siyasî Kurdî têkoşerekî xwedî bi bandor û ezmûneke dirêj di rêya azadîxwaziyê de ji dest da, û li gundê Helecî yê bi ser Urmiyê ve bi xakê hat spartin, û piştî raperîna Adara sala 1991an, û rizgarkirina beşeke mezin ji xaka Kurdistanê , termê nemir Mela Mustefa Barzanî û Kurê wî Idrîs Barzanî di 6ê mijdara 1993an, ji bo başûrê Kurdistanê hatin veguhestin û li devera Barzan hatin veşartin, lê xebata wan di dîroka her çar parçeyên Kurdistanê de hatiye tomar kirin û navê wan di dilê her Kurdekî de zindî ye, û kar û xebat li ser şopa wan berdewam e.





Mahir Hesen

Elmaniya

# Rola rewşenbîran di kûrahiya rastiyê de ye

Dema ku em dibêjin ji bo Kurdan tenê çiya hene, ev nayê wê wateya ku mebesta me tenê çiyan e, lê hin kes dikarin ji me re bibin wekî çiya, bi taybetî nivîskar û rewşenbîrên pêkhate û neteweyên din. Hewldanên hin nivîskaran ji destpêkê ve weke vekirina dergehekê û gihandina rastiyê ji gel û gelên xwe re xuya bibe û helwesta û bala gel jî ji bo şermezarkirina kiryar û binpêkirinên mafên gelê Kurd kişand. Rola rewşenbîrî heye ku ji bo hemû zehmetiyan raman û çareseriyên cuda pêşkêş dike, ji bo civak, azadî, serxwebûn û pêşketina wê, şaristanî ne li ser nezanan, belku li ser xwende û zana ye. bi veguheztina serpêhatiyên serketî ji mirovan re û zorê dide wan ku li gorî şert û mercên xwe li ser wan bixebitin. Gelek dostên kurdan yên rewşenbîr û bîrmend hene. Gelek rewşenbîr hene ku nerîna we zelale, beşek heye ku bi rola temaşevane û ji binpêkirina razî ye, xema tiştên ku diqewime naxwe, ev yek jî tê di xizmeta berjewendiyên wî yên kesane. mijarên rûpî û marjînal, avakirina nav, hebûn û navdariya xwe berdewam dike. wêranker heye ku bangewaziya reşbîniyê dike û civakan gunehbar dike û çanda bêhêvîtiyê belav dike. Tişta ku îro li cîhana erebî diqewime ew e ku gelek rewşenbîr gihîştine qonaxa ku dev ji rola hişyarkeriyê berdin û xwe bi nerînên paşverû dane xuye kirin, yan jî bi tevahî dev ji rola rewşenbîriyê di dirêjahiya dîrokê de berdidin. Ev bû sedem ku gelê wan li ser kurdan fikreke şaş bipejirîne. lê ev bi tev ji bo me negiringin, a balkêş ew ku nivîskarên ereb hene ku piştgiriya kurdan dikin û li ser doz û mafên wî ne. Yek ji van kes yê buye dostê kurdan Fîras Hac Mihemed e. Wî gelek piştgiriyeke manewî da, mîna ku ji hemû nivîskarên cîhana erebî re digot: Binêrin, ti sînor ji rewşenbîriyê re nemaye. Rewşenbîr mirovekî azad e, hevalên wî ji hemû welatan in. Ji ber vê yekê, em ê li ser nivîskar û akademîsyenê filistînî Fîras Hac Mihemed nihêrînek pêşkêş bikin, da ku xwînerên kurd wî baştir nas bikin. Gelo ew kî ye? Fîras Hac Mihemed , di sala 1973an de li bajarê Nablusê li Filistînê ji dayîkbûye, bawernameya masterê di wêjeya nûjen a Filistînê de li Zanîngeha Netewî ya An-Najah e wergertiye. Li Zanîngeha a El-Quds wek mamoste, serpereştyarê perwerdeyê û mamosteyê nîvdemî xebitî. Di kovara Al-Zayzofouna ya ji bo zarokan/Ramallah de wekî edîtorê zimannasiyê xebitî, beşdarî amadekirina materyalên perwerdehiyê ji bo Wezareta Perwerdehiyê ya Filistînê bû û endamê desteya weşanê ya Kovara mafên mirovan ya Navneteweyî bû. Perwerdehiya li Filistînê. Wî gelek gotar û helbest di warên cuda yên weşana rojname û kovarên li Filistîn, cîhana erebî, Brîtanya, Amerîka, Kanada û Meksîkayê de weşandine. Li Filistînê beşdarî semîner, êvarên helbestan û konferansan bû. Pirtûkên çapkirî: Name ji Şehrezade re û ji rîtuelên qehweya tal, ji hêla Weşanxane û Belavkirina Gurab li Qahîreyê/2013, û berhevoka stran û helbestan/2013, û pirtûka Dîwana Prensesa zerafetê/2014, ji hêla Komeleya Zizofûna ve. ji bo Pêşxistina Çanda Zarokan/ Ramallah, û pirtûka "Çerxên Tîbûnê" li ser Dar Gurab ji bo Weşan û Belavkirinê. Û berhevoka "Rewşa bahoz a Xezayê", 2014, û pirtûka "Taybetmendiyên Çîroka Hemdem – Xwendinên Li Ser Çîrokeke Pir Kurte" – Weşanxaneya Mozaîk/ Urdun, û berhevoka "Û tu bi tenê yî, stranek" ji Weşanxaneya Liberty / Quds, bi hevkariya Mala Helbestê li Filistînê, û pirtûka "Rojnivîskarekî bi navê X" û pirtûka "Weke nîv rast be" / Dîjîtal / Filistîn, û pirtûka "Bi Bîranîna Mehmûd Derwîş ", Al-Zeyzouna 2016, û pirtûka "Şeherazade Still Tells - Gotarên li ser Jinan û Afirîneriya Femînîst", Digital, 2017, û berhevoka "Love That", Dar Al-Amal, Urdun, 2017. Pirtûka "Taybetmendiyên Çîroka Hemdem - Xwendinên Li Ser Romanê", Pirtûkxaneya Kulşî, Haifa, 2017. Pirtûka "Taybetmendiyên Çîroka Hemdem - Xwendinên li ser Pirrengiya Çîrokan", Weqfa Ensar El-Dhad, Umm El-Fahm, 2018, û berhevoka " Çi Dişibe Şînayan", Dar Tabak ji bo Weşan û Belavkirinê, Ramallah, 2019, û pirtûka "Zêdevaniya Hunerên Helbestî", Weşanxane û Belavkirina Rawafed, Qahîre, 2020. Û pirtûka "Jinên li Bajêr", Dar El-Raî û Pirên Çandî, Ramallah, û Amman, 2020. Û pirtûka " Beşa yekem a nameya Fa - Roj baş, xanima min", Dar Al-Farouk ji bo Weşan û Belavkirinê, Nablus, 2021. Û kitêba "Rêxistina Ghassan Kenafani", Dar Al-Ra'a' and Cultural Bridges, Ramallah, and Amman, 2021, û pirtûka "Kê Mamosteyê Dîrokê Kuşt?", Dar Al-Farouk. Ji bo Çand û Weşanê, Nablus, 2021 Û berhevoka "Û Çîrokek Piçûk", Wezareta Çandê ya Palestînî, Ramallah, 2021. Berhevoka "Li ser qiraxa helbestê: Evîn heye û mirin heye", Dar Al-Badawi, Almanya, 2022. Û kitêba "Writing in the Face and Confrontation" , Şivan û Pirên Çandî, Ramallah û Emman, 2023. Pirtûka "Sendroma Kanûnê", Weşanxaneya Badawî, Almanya, 2023. Pirtûka "Di Cihê Zimanê Erebî de", Weşanxaneya Badawî House, Elmanya, 2023, û pirtûka "Sira Hevoka Navdar", Weşanxaneya Dîjîtal, Palestîn. , 2023. Û pirtûka "Şikandina dîwaran - Li ser rola wêjeyê di berxwedana tarîtiyê de," Dar Al-Ra' a' û Cultural Bridges, Ramallah and Amman, 2023, û berhevoka "At Heights of Battle," Dar Al-Farouk for Culture and Publishing, Nablus, 2023. Wê ji bilî komek destnivîs û berhevokan gelek pirtûk jî edîtor kirin. Gelek nivîskarên filistînî û ereb li ser vê serpêhatiya afirîner nivîsîbûn û çend hevpeyvîn û hevpeyivînên televizyonê pêk anîn e.



# Genek



Dr.Munîb Ehmed

Bi Kurdî:Genek. Bi Latinî:Ricinus Communis Bi Erebî: خروع. Bi Rûssî: клещевина обыкновенная. Bi Ingilizî:Castor oil plant. Genek giyakî yeksalane ye baş mezin dibê li darê diçê ,lasika wê tepî ye stûre dirêje ,pelên Genekê keskî mezinin wekû lepê destin ,gûlê wê her çend gûl bi hevre hevdûgirtî ne ew jî pîşt re dibin lib ,û lib jî giroverin an jî hinkî dirêjokî ne . Welatê Geneka Afriqiya ye ,li wir zêde mezin dibê dighêjê ta 10 mitra wekû darê çê dibê li Bakûrî Qefqasiya û Naverasta Asya ye. Pêkhateya kimawî:Di libê Genekê de ji 40-60% zeytê dûhnî cih digrin ,Ferment a lipaz,ji bilî wan ta 17% Globûlin ,Albomin,her weha Taksobûlmin -Retsîn ew bi xwe teraseke jehrîye di libê de ye dighêjê ta 2-3%. Di libê Genekê û di organê din ê Genekê Alkaloîd Ritsîn ji 0,1-1% he ye . Zeyta Geneka a kû ji libê Genekê gihiştî tê derxistin bi (gûvaştina germ ) çawa terasa Ritsîn xirab dibê a kû berê me got jehrî ye . Rengê zeyta Geneka sipî ye bi zereve ye bi bihneke taîbete,tîrre û girane lowa ji nav zeyta bi tevaî herî manîhoke (0,97),di nav hêndeyî xwe sipîrtoya 95% ditiwê ,û di pileya germê 16 c`dibê mîna hetwan ,jimara yodî 82-88 e ,jimara tirşî ne bitrî ji 1,5. Zeyta Geneka ne tenê weke Derman tê bikaranin her weha di pîşesaziye de tê bikaranin. Zeyta Geneka bê bandorên rexekî ye loma baş tê bikaranin wekû nermker û ji ber tama wê ya ne xweş bi rengê Emûlsî û Kapsûlê gilatinî tê saz kirin . Zeyta Geneka ji bo bihêzkirina porê tê bikaranin. Genek ji mêj ve wekû derman dihat bikaranin ji laye Firawniya ve û ev tişt hatiye ditin di şûnewarê Firawniya de.





Firyal Hemîd

# Xeyal

Xeyal bazkî birçî ye
Li asîmanekî
bê balinde difire,
Geyayê li ser xakê
di lema xwe de
lihevgeryayî,
dibe Kevokeke di xefkê de
û bi daxistina xwe ya
ber bi jêr ve
wê ji xwe re dike parî
Xeyal,
evîndarekî dûr e
Ku yar ne li ber çavî ye
û wê bi xemla
herî bedew dibîne
Carna dibe firşta hestên wî
û carnan pê re li meyxanê
Meya sor vedixwe.
Carcarnan ew xeyal dibe
kêsmê zarokeke birçî,
ku di xewnên xwe de
tenûrekê dibîne
û Kiloreke bi kuncî
ji destên nanpêjê digre
an jî,
Jêbireke bi bîn
di rêya dibistanê de dibîne
û ji kêfan re wê gez dike
Û hin caran Xe
yal û rastî pêrgî hev dibin
û ji biskên hinekirî s
azên sêga belav dibin